

## Şerê Beyandûr û Haco



Şahoz Haco

Dema şerê beyandûr tê holê gelek gotin û gelek kes li gor dîtinên xwe yan jî li gor bihîstinên xwe li ser vê buyerê gotara dihûnin û carnan jî ji xeyala xwe renga jêra çêdikin ku birastî pir dûrî rastiyan ne..

Li gor min ev buyer bersivêk dîrokî bû ji gelek tiştan re.., tevgereke wisa bû ku li hemberî dewleteke wekî fransa wê sedî sed ne tişteki biçûk be, ev buyer tê wê wateyê ku kurdan her dem li hember zulmê serê xwe rakirna û zulim bi ti awayî li ser xwe qabûl ne kirina, rûdaneke wisa ji min re pêwîst hat ku ez wekî kurdekî xwe lê hembêz bikim û lê bikolim..

Di nav malbata min de gelek caran li ser buyera Bayandûr dihat axavtin, lê brastî gotin bi tenê têrê nakin, gotin gelek caran belge jê re divin, bi taybetî dema ku buyer dîrokî be, ev tişt jî di riya kesne camêr ku brastî xwe diwestênin û dixwazin bigihin rastîyan di derbarê dîroka xwe de. Kesne wekî mamosteyê berêz Xalid Îsa ku bi gelek belgeyên ku ji arşivê feransî derxistine, dide xuya kirin ku çawa Haco axayê havêrka bi vê buyerê rabûya.

Berî niha ev buyer bi zelalî li ser ne dihat axavtin, ji ber çî ez nizanim, bi ser ku me her tim ji tevgere xwe ya kurdî re digot jî, lê mixabin wan tu cara bi zelalî ev buyer ne didan xuya kirin, her tim wekî serhildana gele kurd li hember fransa bi nav dikirin, lê ne digotin kî bi vê serhildanê rabûya û çawa çêbuya.

Ez na xwezim bêjim kî çî got û kî çî ne gotiya lê ez dixwezim ya xwe bêjim, tiştên ku min ji malbata xwe bihîstine û pê agahdar bûma di derbarê vê buyerê de bînim ziman.

Beyandûr wekî qûnaxeka giring di dîroka tevgera berxwedana gelê kurd yan jî gelê kurd li Sûrî li Cizîrê li hembarî desthilatdarê fransî tê bi nav kirin. Di wê çaxê de Sûriya wekî tê zanîn dibin kolonyalîzma Faransa de bû. bê goman buyera beyandûr hewldanek bû li hemberî zordariyakê, li hembarî êşekê, lê balkî ne hewqasî jî wekî ku em kurd dixwezîn bidin xuyakirin ku ew tevgerek bû li dijî Fransa bo standina mafê natewî yên Sûrî. Yanî kesên bi vê buyerê rabûn ne ji bo rakirina desthelatdariya Fransa li ser sûrî, an jî ji bo rakirina kolonyalîzma Fransî li ser xaka Sûrî ev tevgere kirin, lê bi baweriya min bêtir ji bo rakirina zulm neyartiyê li ser xwe

û xaka xwe ev rûdan kirin, yanî ev buyer na Sûrî bû li bêtir kurdayatî bû!!... (eger em navê aşîrtiyê jê rakin ).( Partiyên ma her tim ji xwe ra beyandûr û Yûsif Alazim ,Ebrahîm Hanano wekî nimona welat parêzîya Sûrî ténin ziman ), lê birastî ev berxwedana bi rêk pêk li ser bingihên dî dest pê bûn.

Piştî vê pêşgotinê ez dixwazim li ser vê buyerê biaxivim , Haco axa mazinê hevêrka ye (heverka aşîreka mezina ji 24 aşîrên biçuk pek tê).

Dorika yek ji wan aşîrên hevêrka ne, mazinê wan jî mala Abêsin, di wê çaxê de Silêmanê Abês mazinê wan bû, Abasê birayê Silêmanê Abês û brayekî wî din hatin girtin ji aliyê Fransa ve , ew jî ji ber ku filhan (xaç perestan) gilîyê wan kiribûn li ser çî bû gelo, ev ne diyara.

Fransa wê çaxê pir qadrê filhan (xaç perestan) digirt, ji xwe re wekî hevalbend di dîtin.

Qumandare fransî Abas û biryê wî girtin birin parêzgiha (mexfera) beyandûr ku wê çaxê ordyê askerê fransî lê dima, ev di sala 1923 an de ye.

Fransîyan zulmek pir mazin li milletên herêmê dikirin û metodên wan yê êşkencê pir dijwar bûn, qumandarê parêzgihê Abas û birayê wî çandin ( laşê wan dixistin bin axê de û serê wan dima ji derva te ku miribana ), bi wê êşkenca hovana Abas dimre û birayê wî nîvmirî şandin dugirê.

Silêmanê Abês hewara xwe gihand Haco ku wê çaxê hîn ne hatibû binxetê, hîn Haco li serxetê bû, ji ber ku dorika jî beşekin ji hevêrka, Haco zû bi hewara wan ve hat.

Haco bi nêzîkî 300 peyayî xwe berda binya xetê, li Tilşairê Haco pîlana biser girtina parêzgiha beyandûr danî û di kes ji vê êrîşê ra kirin berpirsiyar, yek ji wan kur apê wî Xelefê Batê bû û yê din kurê wî Çaçan bû.

Xelef û Çaçan bi zilamê xwe re parêzgih wêran kirin û gelek leşker jî tê de kuştin, di wê demê de qumandarê parêzgihê yê fransî, navê wî Rogan bû, ne li wir bû, lê li ser riya dêrikê bû bi karekî, xeber jê re çû, bê çî li beyandûr qewimîya ji ber wilo jî di riya xwe re vegera, lê dîsa Haco di riya wî de bû li devera bi navê diyarê Topê şer dest pêkir.

Şerkî pir dijwar di navbera Haco û Rogan de çêbû, bi sedema vî şerî Rogan tê kuştin, di wê çaxê de wekî tê gotin ku gelek kes tevlî vê buyerê dibin, kurd û erebên herêmê jî tevlî bûn, ji xwe re dîtin ku ew êdî fersendeke ku haîfa xwe ji fransa bistînin û zulma wan li ser xwe rakin.

Helbet mebesta Haco haîfa Abas bû lê ji aliyekî din ve jî rakirina zulma fransa li ser aşîr û milletê xwe jî bû, Haco nikarî bû kuştina Abas wisa hesanî derbas bike, jê dihat xwestin li gor urf û adatan ku destê birayên xwe yên aşîrê bigre û bi hawara wan ve hera, yan jî çawa wê karîbe mazinatî li aşîra xwe kiribe.

Haco axa piştî şerê beyandûr vedgera serxetê û fransa jî metodên xwe nermtir dike li hember kesên herêmê, wisa dimîne ta sala 1926an, Haco axa neçar dimîne ku ji welatê xwe bi reva ji ber turkan (turkan piştî şoreşa şêx Said zulmek mezin li

kurdan dikirin, Haco jî yek ji wan bû ku nema karî bû ku xwe li hemberî zora turkan bigre).

Di roja 18an ji heyva sibatê sala 1926an Haco bi kesna ji aşîra xwe derbasî binxetê dibe, li girkê şamo bi cî dibe, lê turkan bi balafira ew bombe kirin, ji ber vê yakê neçar me û xwe avêt bextê şêx Muhmedê tey serokê aşîra tey ya arab.

Sêx Muhamad qedrê wî û kesên pêra pir digre, lê Haco tê anî der ku fransa doza wî ji şêx dikin û şêx bi vê yekê wê pir êşê eger Haco teslîm neke ji ber vê yekê Haco beryar da ku ji cem şêx here û xatir ji şex dixweze û berê xwe dide dugirê cem Silêmanê Abês, yê ku bixwe dostê Haco ye û aşîra wî ye.

Haco hevalê xwe Galyê Şabo ( bi xwe filiha û ji aşîra hevêrka ye) rê dika Musilê, ku bi englîza re bi axive ta ku hera Îraqê, lê Gelyê Şabo dest vala vegera, englîzan şert û mercên giran dan pêşiya wan, şartê englîza yê pêşî ev bû ku Haco û zilamê wî bê tîfing xwe teslîm bikin, û şertê didwan ku wan koçberî başûrê Îraqê bikin, ev şart bi Haco pir giran hatin û ji ber wilo jî beryara xwe da ku here û xwe taslîmî fransiya bike.

Haco bi siwarî li ser hespa Rogan bi xwe û bi hevalê xwe yê mêraxas re Osê Azam çûn Qamişloyê û xwe taslîmî fransa kirin.

Fransa Haco şandin Beyrûtê û li wir afûa wî dan. Gelo çima Haco hat afû kirin ne diyare, lê di wê demê da fransa û turk ne li hev bûn, belkî fransa dixwest ku Haco ji xwe re bikar bîne li hember turkan.

Piştî afûa fransa Haco û zarwê wî û beşek ji aşîra wî li binxetê bi cî bûn û gelek gondên nû ava kirin.

Di dawî de beyandûr eger çibe jî helbet dîsa tevgera gelê kurde li hember zor zordariyê ye, zordariya ku ti caran kurdan li ser xwe qabûl nekiriya. Tu carî di dîrokê de kurd li xwe mukir ne hatina ku zilmê qabûl bikin û li ser xwe re derbas bikin, kurdan her tim li ber xwe dana û di beyandûr de jî kurdan li ber xwe dan.

Zarathustra News - [Zoroaster@comhem.se](mailto:Zoroaster@comhem.se)